Bi ser hatî û bîr anînek li Pêşmergatîyê



Ez bo cara ewil 8 ê Janîvar a sala 1996 ê bome bab , helbet zarokek me sal u nîvekê pêşde hate dinê u nema . 8.1,1996 Sîber a delal u bedev Çaw bi dinya a ronî wekir .
Li Hewlêr a Paytextê îroye Başorê welat u ronahî êxist jîn u jîyana min.
Rojek li wan rojê sare Cêjnîkanê Seîde kete ber halê zaro bonê , Cêjnîka u Behrike ku 15 Kîlomêtra li Hewlêr ê du bon li kontirol u îxtîyara Dewleta Partî Pdk Başor de bon u , Hewlêr li bin Rikêfa Ynk ê de bu .
Li Cêjnîkanê heta Hewlêrê dibe em li çend Seitere , an ku li kontirola wan du hizba derbas bana , her yek ji wan li me dipirsîn ewê din çi dikin , çend kes li wê rê hene u dehha pirsên bê cî gotinê nexweş u , Partî a diprsîn Lo çî Kirasî Zerd Teber naken u , Ynk a dipirsîn Bo Piştênî Sewiz nabestin .
Car na car jî daxwaza. Rişvet u bertîlê li me dikirin , Du qalib Seholman lo bênin , an jî Du paket Sîgarman bo bikirin u daxwaza Parsê li me dikirin u bihane digirtin.

Min xwere nedît ku em pê Maşîna Hizbê herin , ji ber ku Maşînê Hibê Pilakê naskirî hebon , wî heyamîjî kurdekî Rojhilat Koştin nêzokî çend hizar Tomen dikir u Ferdeyek Arid jî serde , ca heke ew Tirore Hizbek Başor li pişt ba Çend seferekî Tehran u Îsfehan u Şimal jî lê zêde dibon hey qet bi zêde nebe.
Bi. neçarî em bi yêk du hevala re u bi hev jîna hevalekî Pm re çone Nexweş xana Zaruk bonê .
Em li hewşa nexweş xanê sekinîbon u Seîde u ew xoşka din birine jorê zaruk bonê .
Paş qederekî ku ez bi kele jan u sitirês li benda Zaroka xwe bom , jinek Perestar hate derva u pirsa nawê min kir.
Ez lê çome pêş u min. xwe pê da nas kirin , got mizgînîyê bide min ku to boyî babê Kurekî u min xelatê wê ku pare bo dayê u bi dilek xweş sipasî lê kir .
Sipas kirin u keyf xweş bona min li rastî. de tinê bo silametîya Seîdê u zarukê taze bi dinya hatî bo ku bi silametî çaw bi cîhana ronî wekiri bu .
Paş qederek ne direng Seîde u ew xoşke hatin u ez bi keyfxweşî lê çome pêş belê em bone xodanê Kiçekî . Ewê perestarê li ber ewê got zaruka we kurike ku mixabin li hemo Civakê paşde mayî u bi xasmayî li civaka Kurdî de zarokê Kur bi qîmet tire .
Em bi silametî wegeryane Cêjnîkanê u keyfxweşin ku bone xodanê Kiçek bedev bi navê Sîber .
Nizanim li bê tecrobeyî bo , an dayika Sîber ê kêm şîr bu , Sîber hinde digirya ku carna ez nîvê şewê diçom miqerê dinivistim
Sîstema derman u doktor ê Başor tam wekw Sîstema Îflas u Fesade Îranê ye , carê to dikarî bi rişwet u bacê wexit li bal Doktor bikirî , bila sedan kes li pêşîya te wexit girtibin .
Bo zaroka taze li dayik boyî tam bi qasî mirovelk bi temen Heb u Derzî u Şerbeta dinivîsin u dibe ku ew Derman xana ku ew dibêjin jî to dermana Lê bikirî . Neku ???
Sîber du heyvî bo ku xirab nexweş ket u me Sîber li nexweş xanê li Hewlêr ê. razand , Şerê Partî u Ynk , welat Tehrîm , di naw welat de Kurdistan bê îmkan u li hemoyê xirabtir Pm li hemoya bê îmkan tir bon .

Pare u xercê Doktor dibe me li kîsê xwe daba , bo hat u çoyê ku ne Memoryet . An ku ne wezîfa hizbî ba dibe me li berîka xwe pare daba ku bi rastî dest u pê. li mirov dihatne girê danê .

Rast di wê nabeynê de ku Sîber nesax li Hewlêrê li nexweş xanê , Komîta Amoziş , an ku Organa Fêr kirinê DewreyeKe. Alî , an ku bilin danîn bo amadekarîya Kadrê derece sê li binkê Deftera Sîyasî.

Ber pirsê wê Komîta Fêr kirinê kek Têmor Mostefayî endamê komîta nawendî bo , lê li rastî de. hemo karê Fêr kirin u amade karî u pê gehandinê Li. ser milê Hevalê hêja u xebatkar Kek Simaîl Bazyar bu .

Li her Komîte Şaristanekî bi gorekî Texsîm karîya Hizbê Yê kes u li her Organekî Hizbê jî Yêk kes li wê dewrê de pişikdar bon .

Tinê li Komîta Selmasê du kes bon ku Ez u M sali Qadrî bon . Rastî bo min hêsan nebo ku ez Seîdê u Sîber li Nexweşxanê cî bihêlim u Dewre ê jî dest pê kir bo bi cî bihêlim U Dilê Kek Simaîl li xwe bihêlim .

Li alyê din min pê ne xweş jî bo gotina kek Simaîl Bazyar li erdê bidim u her digot ku dibe to pişikdar bi li dewrê de , ez sê roja dereng çome nav refa hevala li Qela ê bo amade bon li kilasê.

Li Cêjnîkanê em pênc kes ço bon . Ez , M. Salih Qadrî , Li Şino ê Sofî Ehmed , li Nexedê Usib Mewlodî u Pîranşehrê M.Solêmanî.

Dewryek gelik baş u me karî ku em gelik Dersên baş li ziman kesên xwedî tecrobe we çi kesayetîyê Hizbî u çi mamosta ên Danişga ê ve fêr bin u mifahê lê wer girin . Kesatî ên Hizbî ew kes bun ku bi gorekî Xwendin u Pisporîya xwe şareza bun u , Çar mamosta ê Onîversîtê jî. ku xelkê Başur ê welat bun u li Zanistgehê Îraq u Kurdistanê bi salan li Xwendigehê bilin mamostatî kiribun bun .

Mixabin Du li wan Mamosta ya nawê Şirîn u rêzdare wan li bîra min nayê ku her du li ser pirsên Civakî u sîyasî u dîrokî diseknîn hebon u du ê din D. Pirefisor Êzedîn Mistefa Resul u D. Pirefisor Marif Xeznedar bun .

Ji ber ku bi hegerekî ku ez bi hur u kurî nizanim bêjim her. dukê wan rêzdara gotibun dibe ku. un pêşde min gazî bikin , yêkekî wan mixabin nehate ser Kilasê ku mamosta u Rehmetî Marif xeznedar bu ku nebu nesîb em li nêz va bibînin u li zanist u tecrobeya wî jî gelik gotin u tecrobeyan bi elimin .

Weke min anî ziman ku Dewreyek gelik li alyê zanistî va dewlemend bu. , ewa ku me karî em weke Kadirê Hizbê ku her yek ji me li Herêmekî Dur e welat re hatibun balkêş bu , gelekî ji me çi carî me hw nedîtibu u nas nedikiri .

Em weke Kesên ku li Cêjnîkan ê re çobone Dewrê, u hevalên ku li Komîte u Melbendê Cinob ê re hatibon li Xabgahê li Qela ê diman u hevalên ku li Komsyon u Komîte u Hêzên nêzok li Pulîd buru ê re hatibun bi şew wedigeyane binke u Meqerê ku lê diman.

Nas kirina wan heval u hev sengera li wê Dewrê de bîr anîne ke ku ez çi carî ji bîr nakim u her tim şanazîyê pê dikim u xwe ser bilind dizanim .

Bi xasimayî. her. sal xilas buna Dewrê de du li wan Têkoşer u mêr xasane. kek Şehram Mênberî u kek Salih Seqzî bi awayekî gelik ne camêrane u li alyê xwe firoş u xaînekîve hatine Derman xwarî kirin .

Kesê din kadirê nas kirî kek Samal bu ku tevî çend hevalên din Kek Seyîd. Mensur Nasirî u Xebatkarê bi nav u deng kek Mensur Fetahî li alyê YNk ê u di roja ronahî de li Posta bazresê a bajarê Koyê ji alyê endamê serokatîya Ynk ê hatine qetil kirin u rihê wan şad be .

Kesê din. kek Mîrza birahîm kadrek nas kirîye bajarê Serdeştê ku çend sal berî niha li alyê rijîma Tirorîste Komara Îslamî we di kom civînekî Hizbî di li. Qelayê de u bi çend hevalê xwe we hatin Moşek bran kirin u canê xwe kirin gorî azadî u ser bestîya gelê xwe . Rihê pake wan şad be .

Hewceye ku bêjim hemo ew hevalên ku em bi hewre li wê dewrê de bun eksa wan ewe ku min di pişka yêkê da belaw kir ku di cejina xilas bona dewrê de hatye girtin u rol u nexşê hevalê hêja u xebatka kek Simaîl Bazyar hem li cejnê de u hem jî li gotina kilasê de weke mamostayê Tarîx ê gelik balkêş u ber bi çaw bu

Dewre ya me bi silametî xilas bu .
Me teva xatirê xwe li hew u li Mamosta. Simaîl. Bazyar xwest u her yek ji wegeryan wan komîte u Meqerê ku cihê têkoşîn u xebata me bo .
Bi Dîtina Sîber a bedev ez gelik kêf xweş bum . Hêj heyamek mabu ku Konfiransê salana neye Komîte u Melbenda dest pê bikin , min kek. Silêman weke berpirsyarê. Komîtê agadar. kiribo ku ez Vê. salê xwe ji hilbijartina çi postekî bo kar u barê Organê xwe na hilbijêrim u min qirara xwe daye ku ez Cihê xebatê Wegohorim bo Cîhana. Xorbetê. An ku. Ewropa yê .
Konferans u. Hilbijatin ku xilas bun , min u Sê çar hevalê din me Zarokê xwe li pêş xwede şandin bu Bakur ê welat li Rêka ne qanonîre .
Rastî min karîna kirîna Pasport ê Xercê Zore Derbas bonê bi awayê Qanonî ne bo , lewma bi naçarî min ew rê hilbjart .
Kêm u zêde u nêzokî du heyveka derengtir Komîtê qirara xwe da ber bi cihê bo naw xweyî welat rê bikewin .
Qerar ew bu ku hetanî cihê Mexsedê ez hevala re bim u paşê ez Xatirê xwe li wan u bera xw bidime Xerîbî u Xorbetê .
Dema wê hat hevalê Komîta Tîmê xwe ê hewce amade kirin u em li Cêjnîkanê ber bi Axa welat u cihê kar u xebat u Rêkxistina Hizbî rê ketin .
Rêke gelik du u dirêj , bi xasimayî paş heyamek dirêj ku zêde negeryayî beden hindekî tembel dibe heta çend rojeka rêçona çol u çîya u ewraz u nişîva zehmete .
Axirîn roja ku me dixwest di naw xwelîya Bakur ê welat re derbasî xwelîya Rojhilatê wela bibin , hevalên ber pirsiyar u xodan biryar li hew civiyan ku zelal bikin ka em li kîjan xala Sinorî re derbas bibin .
Paş ku kom civîna hevala xilas bo ez çome bal Kek Silêman u min lê pirsî we biryar da ka emê li lîjan derê re derbas bibin , got erê u li Flan xalê , kek Silêman çend salek bu ku cîyê ximeta Hizbîye wî li herêmê dinê ye welar bu şarezayî. ya li ya me hinek hevalan kêmir bu .

Ji ber ku di wî heyamîde gelik gohertin hem alyê eskerî u hem jî alyê dostatî u elaqatê me Turka de hatibune pêş .
Lew ma min gote Silêman we biryara xwe daye , lê bi nêrîn u Tecrobeya min ew rêka ku we dest nîşan kirî qet minasib nine u min pêşnîyar u nêrînê xwe jêre anîne ziman .
Lê kek Silêman got hewala ew der u ew Rê bi meslihet zanîne u min jî qebol kirye taze emê her li ser qerarê ku me dayî herin .
Ewê rêka ku hatibo hilbijartin hem gelik dur u dirêj bo ku îmkana der bas bu bo naw xwelya Rojhilatê nebo ku di şewekî de em derbas bibin .
Hem jî li ser wê rêkê çen Gond hebon ku em dihatine dîtin u cihê pê me dihate peyda kirin u .....
Lê ew rêya ku min pêşnîyarî Silêman kirî tinê Gondek li ser Rêka me bu , îmkana xwe. sitar kirin u cî bi cî bonê Zêdetir u xweştir bu .
Lê her weke min li serî de bas kirî min çi heqê Qerar u biryar danê nebo .
Em çon u her wekî min gotî , me nekarî ku di dema xwe de naw xwelîya Bakur ê welat derbas bibin u xwe bigîjne cihê mexsedê .
Me bi şew li Gondekî Gelîyê Dirya nanek Xwar u bêhnek weda ,
Em rê ketin di wextek şewê kort ê Havînê u Rojên dirêj .
Em Tam westîyayî u nerazayî , her wisa bin ewrazek li pêşîya me ye ku di dema Jêlde çonê de devê mirova digi hîşte erdê .
Em qederekî li Gondê ku me nan xwarî dur ketin , min zanî ku M. Salih weke Ser pereStê Nizamî yak li biryar dera u Ebobekir Îbrahîmî ew ji Li wan Fermanderê bi cerig u xodan tecrobe li me we qetyan ku xoya bu dixwasti Dîtinek bi Qereqolê re li Tixob re hebin bo hat u ço u derbas bonê .Ku li des pêka her salê de me ew hew dîti nane nu dikirin .
Ji ber ku ew deshilatdar u ber pirsê Eskerî bi salê carek piranîya wan dihatine guhertin .
Hewceye ku ewê jî bo xwendewanê delal Zelal bikim ku , paş KuDita ya 12 ê Îlona 1980 wirde her Memorek Dewletî ku teze Kar u pile li Dewletê wer di girit , Doktor ,

Mamosta , an ku Moelim , perestar, Polîs , an jî li her Îdareyekî Dewletê de kar kiriba ,
dibe alyê kêm salekê di herêmê Kurdî de xizmet kiriba U paşê weger yaba bajarê xwe an bizivirya Metropolê Turka .
Her li Wi cîyê ku ew li me coda bonî me bêhnek kort weda u em jêlde rêketin , hendek heval her bi mijul bona Cigare kişandinekî cîde man , em hindek jî hêdî hêdî me bin evraz da pêşîya xwe .
Qederek din jî em jêlde ço u çend hevalek ku bi başî li bîra min nine ku çend kes u kî u kî bun bi. Nacî Feqî Por re li me weqetyan u çon ku ser bikewne ser sinor ku bi avayekî ku bo me bibne piştîban .
Me di qeda bin ewraz de bêhnek weda , Emîr Cehandîde xortek xweîn şirîn u şermoke. taze pê giheştî li bal min ronişt , min gotê Emîr to genc u pir enerjî , dibe to hinde zo newestî. got belê raste , lê Îro ez gelik westîyame , qedemê min nagrin ez herim. Weke qedem surê ez girtibim .
Ewa gotina didomand li alyê serwe hinek heva kirne gazî ku Li gewrîya Du Guh hinek Esker xoya dikin.
Ê , çi bikin , îmkana jêlde çonê u gihîştin bi alyê dine Sinor nine u em nagîjnê .
Ewanê ku ber pirsyar bun weke Silêman , Nayîb u esker heke baş li bîra min mabe biryar der bun .
Ez li biryar danê de nebom , lê min gote wan ku , di haletelî hanekîde îmkanna Qise kirin u got u bêjî bi Eskera re nine .
Em hev u du nas nakin u Xisletê Turk a u Eskerê Turka wisaye ku to di hember de kêm bînî yê sarê serê te bin .
Lê hevala bawera wan ewe bu ku ez herim bi wan re qise bikim u bêjmê em kine u .....hnd .
Ewan her dihatin u çember li me teng dikirin u pêşmerge jî nizanin çi bikin u çi bêjin u çawê wan we kirî maye li biryar dera dinêrin.

Silêman u Nayib daxwz li min kirin ku ez herm u bi wan re qise bikim , Esker jî Nire nira wane u ez mezlum u bêçare dîtine u her têne pêş Heliqa dor pêçê li dura me tengaw u tengaw tir dikin .

Ez çom ku bi wan re qise bikim , lê bi rastî ez çom ku bême koştin , min weke xwe gelik baş Piskolojîya Tirka u Eskerê Tirka dizanî u dîtibu , bi destê wan carekê jî hatibume Êxsîr kirin .

Min Kola Piştî u Sakoyê xwe danîn u bi hejandin u bilind kirina Axa banîya xwe li dest de ez dihejînim u diqêrinm , em Pêşmege ...

Me bi were Şer nine u ez bi Turkî nawê Mesolên Par u Pêrar tînime ziman u zimanê Rica u Temena u Xwahîşê li dikim ku bihêlin em bi hewra qise bikin .

Pêşmerge tên li hew Kom dibin u Esket jî dor pêça me tengaw tir dikin .

Fermandê wan di niweka wan de u bi Îşaret got were alyê min , ez her lê nozok dibim u ew paşve diçe , 2,3. Mêtrek mabon ku ez destê wî bigrim bi Turkî destora Şilîk u gole baranê da . Atiş edin. ,An ku golebaran bikin .

Ez paşde wegeryam u jorde bezîm , PM li milê min ê çepê u li min ewraz ketibun u îmkana jêlde çon bo bal wan nebo .

Awek li qerax me jorde diço u dora awê Giya u So. bilind boyî u min xwe berda nav wê dolê u So a bilind , min milê rastê rêhênî bi Çaw girtinekî, bêrehmane li PM a didan u dikoştin .

2,3 esker ketine pê min u ez dame ber gula , ji ber ez jorde dibezîm u ewan jî bi bez teqe li min dikirin Xodê jê razî nebe nekarîn min bikojin .

Ez li koştinê razî bom , lê rastî min nedixwast ku carek din ez Exsîr bibim u .....

Şirşireyekî gelik bilin u hemo kewir li pêşîya min hebo u min dizanî u bi deyan cara li serê Şor Şorê ku Rê hebo têre derbas bibom .

Lê min xwest ku ez bila bim rim u bi saxî nekewme destê wan

Nayê bîra min ka ez çawa li wî Şor şorê Çendîn Mêtir bilin dijwar re weres yame xwarê , min çawê xwe wekîr , ez nav gola avê de , min xwe bizivand , ne ez saxim hêşta , nizanim ka çend bêhiş bome ez nizaim .

Li naw avê der ketim. Doxîna şalê min qetyabo. Min hindî hewil da min nekarî ez girê bidim .

Min her xwe grêl dikir u ez jorde diçom , gohê xwe ser de digrim çi deng nayê gohê min.

Lê hemo bedena min êş u jan têdeye u Dest u ling u namilê min hemo dişên .

Dilê min ço cigarê u min dest da berîka xwe , lê cigare bibo aw u nermijî bu .

Min xwest avê wexom u min dewê xwe kirye ava Cemidî u zelal , lê dilopek av naçe gewrîya min .

Wê gavê çawê min kete hinek hevala ku jêlde dul u dul alyê mive tên , heke bi başî, bîra min mabe , Kawos Ezîzî , Mêhran Mîrzayî, Şêrko Pûrdil , Ferhad Pîspayî , Ferha dmîrozade , xebat, Seyd Mihemmed Tahirî û Elî Elîzade bûn . Sero çawê min hemû birîn u xûn ser ser u çawê minde tê xwarê .

Dest u mil u lingê min hemo birîn u cî derketî u ez , hema minrinLi bejin u bala min kême .

Cigareyek dane min u min ya ku qewmî wan re bas kir u bîra min nine ka kî bal min ma u me bera xwe alyek din u em li hevala bi yêk carî weqetyan u dûr ketin .

Di wê boyer a tal u nexweş de sed heyif u mixabin .

8 Li xortê hêja u ji nu va pê giheştî,bi nawên . 1Qadir Emîrî 2. Sadiq Hesenzade .3. Emîr Cehan Dîde .4 Resul Hemîdî .5 Şemsedîn Resulî .6 Cemal Raî .7 Eskender Elîzade .8 Evdî Baqoyî bone can gorî u çone nav refa karwanê can fîda u can bexit kirye azadî u rizgarîya welat .

Bila rihê pak u kurdaneye wan can gorî ya her tim şad u serê malbat u bi xasimayî Dayk u baba u hew bîrê wan sax be u ez Bejina xwe di hember kede u can gorî bona wan de diçemînim .

Ew çi car ji bîra me naçin u her tim di dilê mede dijîn .

Hewce ku bêjim Can gorî Ebdî Baqoyî bi Êxsîrî dikewe dest neyar ku li sed cadeya bin Gondê Basanê Îdam dikin u weke min zanî cenazê wî agir berdabonê u Qadir Emîrî bi birindarê xwe dike bi kewirekî ku Esker nabînin .

Paş çend rojeka dereng tir ku ez li gondekî gelîyê Dirya bum u kesek hate bal min u got ku Şivanê me li Filan semtê u bi filan Kewrî cenazê Pêşmergeyekî dîtine .

Min bi nîşana go bas kirî zanî ku can Gorî Qadire , Ew xelkê gonê Bêrdukê di herêma Soma ê bo ,

Kesê ku ew xebere dayî binemala Qadir baş hew nas dikirin .

Min daxwaz lê kir bi zotir wexit malbata Qadir agadar bikin u wan re bibne arîkar .

Ku qebol kir .

Lê ew hevalên din cenazê wan jî kete destê Eskera u li kîderê weşartin ez nizanim .

Bûyera tal ya şehêd bûna 8 hevala Di 1/4/1375 ya rojî de bû.